

## Li herêma Salzburgê navnivîsîya ji bo vaksîna Corona

Ji 15ê Sibatê û pê ve, hemû kesên ser 16 salî yê li Salzburgê dikarin bi ser înternetê yan bi rêya telefûnê ji bo vaksîna Coronayê navê xwe bidin nivîsandin.

Dema nanivîsîyê li ser roja vaksînkirinê bandorê nake ji ber ku di vî warî de li herêma Salzburgê bernameya vaksînkirinê ya awisturyayî derbas dibe. Dema ku vaksîn ji bo lêdanê amade be, kesên ku navên xwe dane nivîsandin ewê yekser bi awayekî çalak werin agahdarkirin. Ji ber ku niha hejmara vaksînên amade sînordar e, ev yek dikare demekê biajo.

„Di vî warî de lava em ji we dikin, ku bi sebr bin, ji ber ku komên di bin metirsîyê wekî berê xwedî ewlewîyetê ne. Vaksîn ji bo pêşîlêgirtina birêveçûna giran a nexweşîyên Covid rêya herî baş e, lewma ev yek wekî bijîşkan wezîfeya me ye, ku li gor vê yekê kesan dor bi dor vaksîn bikin- anku bi gotineke aşkere, da ku em barê sîstema tendurustîyê siviktir bikin û jîyanê rizgar bikin, divê ev pêvajo dor bi dor bimeşe“, dibêje koordînatore vaksînê yê herêmê, Dr. Robert Sollak.

### Navnivîsîya ji bo komên di rîskê de

Kesên ku nexweşîyên wan ên berê hene, ku pê dikevin nav koma kesên berrîsk, ew jî dikarin ji 15ê Sibatê û pê ve li rêya Hotline a tendurustîyê ya 1450 û li ser înternetê li ser navnîşana [www.salzburg-impft.at](http://www.salzburg-impft.at) navên xwe bidin nivîsandin. Li vê derê divê nexweşîyên ku ji berê de hene werin nîşan kirin yan dîyar kirin. Raporek, ku vê nexweşîyê pesend dike divê di dema vaksînkirinê de bi bijîşkan werin pêşkêşkirin. Heger bijîşka we bixwe vaksîna we bike, wê demê raporeke doktoran ne hewce ye.

### Dane û agahîyên ji bo navnivîsîyê

- Ji 15ê Sibatê û pê ve, hemû kesên ser 16 salî yê li Salzburgê
- Bi rêya telefûna Hotline a Tendurustîyê 1450
- Li ser înternetê [www.salzburg-impft.at](http://www.salzburg-impft.at)
- Piştrastkirina nanivîsîyê bi SMS, E-Mail yan name
- Navnivîsîya ducarî ne hewce ye
- Dema navnivîsîyê bandorê li ser roja vaksînkirinê nake
- Roja vaksînkirinê li gor ewlewîyata lijneya netewî ya vaksînkirinê
- Agahdarkirina bi awayekî çalak a di derbarê dema vaksînkirinê ewê li gor amadebûna vaksînan pêk were